Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :427 nameronahi@gmail.com 05- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Çend ji fermanên li civaka Êzidî rabûn





**Qasim ENGÎN**

Şêwazê kuştina Êzîdiyan di rastiyê de heta vê serdemê tê.
3'ê Tebaxa 2014'an qirkirina ku wek fermana 74'emîn tê terîfkirin di rastiyê de ji aliyê hêzên desthilatdar ên jirêderketî ve hatine kirin ku Êzîdîtiyê wek ol qebûl nakin, wek derveyî ol dîtine û kirin hedef. Her çi qasî bi êş jî be em diyar bikin ku di gelek fermanên li hemberî Êzîdiyan de mirov hêzên serwer ên Kurdên Sûnî dikare bibîne. Dîsa em destnîşan bikin ku li hemberî Êzîdiyan tinekirina herî berfireh û sîstematîk jî Osmaniyan pêk aniye.

## FERMANÊN LI ÊZIDIYAN RABÛN

Fermanên li hember Êzîdiyan pêk hatine, mirov li vir yek bi yek rêz bike, tevî ku ev ê tiştên rû dayî li ber çavan raxe, êşên rû dayî kêm be jî wê veguhezîne roja me ya îro, mimkun e ku empatiyê jî biafirîne. Em li jêr weke kronolojiyekê berê xwe bidin van fermanan:

**906**: Waliyê Mûsilê Hamadanî hezar malbatên Êzîdî yên Îslamiyet qebûl nekirin, qetil kirin.
**980**: Hêzên desthilatdar ên li Mûsilê êrişî Kurdên nemisilman ên li Colemêrgê kirin. Kurdên nemisilman yan bi daran ve hatine daliqandin yan jî serê wan hatiye birrîn û kirine qazoxan.
**1107**: Nêzî 500 hezar kes ji aliyê artêşên Îslamê ve hatine qetilkirin.
**1245**: Moxolî ketine Şehrezorê, bajar hilweşandine û bi hezaran Êzîdî qetil kirine.
**1254**: Begê Mûsilê, Bedreddîn Lûlû, êrîşî herêma Şêxan kiriye û bi hezaran Êzîdî qetil kirine.
**1221**: Şêx Hesen hat revandin û bidarvekirin. Dema Êzîdiyan xwe spart herêmên çiyayî, cihên wan ên pîroz hatin wêrankirin.
**1415**: Êzîdî ji aliyê Misilmanên derdorê ve hatin qetilkirin.
**1640-41**: Artêşeke ji 70 hezar kesî di bin fermandariya Melik Paşa yê Waliyê Amedê yê Dewleta Osmanî de, êrişî Şengalê kir û li dijî Êzîdiyan komkujî kir.
**1647-48**: Artêşa di bin emrê Waliyê Wanê yê Osmaniyan de êrişî Şêxan kir û li dijî Êzîdiyan komkujî kir. Şêx Mîrza esîr hat girtin û hat bidarvekirin.
**1715**: Waliyê Bexdayê yê dewleta Osmanî, Hesen Paşa êrişî Şengalê kir, Êzîdî qetil kirin û rêveberiya herêmê da Erebên Bedewî.
**1733-34**: Paşayê Osmaniyan, Ehmed Paşa li hemberî Êzîdiyên li herêma Şengalê komkujî kir.
**1752-53**: Hêzên di bin fermandariya paşayê Osmanî Silêman Paşa de êrişî Şengalê kir, gelek Êzîdî qetil kirin. Hêzên Osmanî yên gund û cihên pîroz ên Êzîdiyan texrîb kirin, nêzî 2 salan li Şengalê man.
**1767-68**: Emîn Paşa yê Waliyê Mûsilê yê Osmaniyan, artêşek da ber fermana kurê xwe, li Şengalê komkujî pêk anî.
**1770-71**: Dema Emîrê Şêxan, Bedag li hember rêveberiya Osmaniyan li ber xwe da, li Şêxan komkujî hat kirin.
**1773-74**: Waliyê Mûsilê Emîn Paşa, herêma Şengalê xera kir, hilweşand û komkujî hat kirin.
**1779**: Vê carê birayê heman waliyî êrişî Şengalê kir û gelek Êzîdî qetil kirin.
**1785**: Waliyê Mûsilê yê Osmaniyan Ebd El Baqî êrişî Êzîdiyên li Denenedî yê li Rojhilatê çemê Dîcle kir.
**1786-87**: Emîrê Şêxan Çolo, li hember Waliyê Amediyê li ber xwe da, dema Çolo di berxwedanê de têk çû, Êzîdî rastî komkujiyê hatin.
**1789-90**: Eşîra Tayy a Erebên Bedewî, êrişî Şengalê kir û komkujî pêk anî.
**1790-92**: Eşira Tayy êrişî herêma Şengalê kir.
**1792-93**: Waliyê Mûsilê Muhammed, 8 gundên Êzîdî yên li herêma Şengalê wêran kirin.
**1793-94**: Waliyê Mûsilê Muhammed careke din êrişî Şengal û Mîhîrîkan kir.
**1794-95**: Hêzên bi emrê Silêman Paşa ji Bexdayê hatin şandin, herêma Şengalê hilweşandin û talan kirin.
**1799-1800**: Ebd el Ezîz Tayy ê ji Bexdayê hat şandin tevî Bedewiyên xwe bi alîkariya eşîrên Ereb ên weke Obeyd û Hamdan li Şêxan 25 gundên Êzîdiyan şewitandin û ew gund wêran kirin.
**1802-1803**: Waliyê Mûsilê Elî Paşa êrişî Şengalê kir. Di vê dorpêç û êrişa bi mehan dewam kirî de bi dehan Êzîdî hatin qetilkirin, erdên wan ên çandî hatin texrîbkirin.
**1809-1810**: Waliyê Bexdayê Silêman Qatil bi hêza efser Husên Dublayîn êrişî Şengalê kir, Balad, Şengal, Mîhîrkan û gelek gundên li Bakur talan kirin, komkujiyeke mezin li dijî Êzîdiyan kir.
**1832**: Bedirxan Begê êrişî herêma Şêxan kir (Hingê ne mîr bû). Elî Beg esîr hat girtin û bi êşkenceyê hat qetilkirin. Gelek Êzîdî hatin qetilkirin. Li nêzî ava Dîcle rêya Êzîdiyên ji Şêxan direviyan çiyayê Şengalê hat girtin û hatin qetilkirin. Bedîrxan Begê piştî 12 salan vê carê jî êrişî Êzîdiyên Torê kir û Misilmantî li ser wan ferz kir.
**1832-33**: Mîr Muhammed Rewanduzî êrişî Êzîdiyên li herêma Akrê kir. Paşê sala 1834'an êrişî herêma Şengalê kir û komkujî pêk anî û Mîr Elî Beg ê misilmantî qebûl nekir, bi êşkenceyê qetil kir.
**1836**: Waliyê Amedê Reşîd Paşa bi artêşeke 40 hezar kesî ku Kurdên Misilman jî di nav wan de bûn, li hemberî Êzîdiyên li Rojhilatê Amedê û yên li Xerzanê êriş pêk anî. Li dû wê êrişî Cizîrê, Telafer û Şengalê kir. Di wan êrîşan de bi hezaran Êzîdî hatin qetilkirin, bi sedan esîr hatin girtin û weke koleyan hatin xebitandin.
**1838**: Vê carê Hafiz Paşayê hat şûna Reşîd Paşa bi armanca bidestxistina Şengalê êriş kir. Zilam û xortên Êzîdiyan hatin qetilkirin, jin û zarokên wan esîr hatin girtin û birin Amedê.
**1846**: Waliyê Mûsilê Tayyar Paşa Cotmehê êrişek bir ser Şengalê, gelek gund şewitandin.
**1853-56**: Di dema şerê Osmanî-Qirim de Yezdan Şer ê xwarziyê Bedirxan beg ku serhildan da destpêkirin, Êzîdiyên li Sêrt û Serhedê piştgirî danê. Ji wan Êzîdiyan bi sedan kes hatin qetilkirin, pirraniya wan bi qebûlkirina Misilmantiyê, canê xwe xelas kir.
**1856**: Êzîdiyên bi hin eşîrên li herêma Çiyayê Dêrsimê re li hember serweriya Osmanî serî rakirin, piştî serhildan bi ser neket, bi Kurdên Dêrsimê re rastî komkujiyê hatin.
**1872**: Waliyê Bexdayê Mithat Paşa ji bo Êzîdî eskeriyê ji dewleta Osmanî re bikin, biryarek derxist. Êzîdiyên li Başûrê Kurdistanê li hember vê biryarê derketin. Rêveberiya Bexdayê ev weke îsyanekê dît, êriş bire ser Şêxan, gundên Êzîdiyan hilweşandin.
**1877**: Dema li hemberî Êzîdiyên li Amed û Xerzanê êrişeke nû pêk hat, 3 hezar Êzîdiyên di bin berpirsyariya Elî Begê de koç kirin û li Alexsandropolê bi cih bûn.
**1879**: Eşîra Sîpka ya di bin berpirsyartiya Emer Axa de sirgûnî Qersê hat kirin. Hejmara sirgûnkiriyan di nîvê Şerê Yekemîn ê Cîhanê sala 1916'an de zêde bûye û gihiştiye 40 hezarî.
**1890**: Li hemberî Êzîdiyên Başûrê Kurdistanê yên li dijî polîtîkayên zext û zilmê yên Osmanî disekinîn, tevgereke îmhayê hat lidarxistin. Bi sedan Êzîdî hatin qetilkirin, bi sedan malbat neçar man koçber bibin.
**1892**: General Emer Wehbî Paşa, biryarek derxist ku hewce ye Êzîdî hemû yan bibin misilman yan jî oleke ku di Quranê de heq e, hilbijêrin û bi vî awayî zemîna komkujiyeke nû li hember Êzîdiyan amade kir. Li hember Şêxan û Şengalê êrîş hatin lidarxistin. Li dû van komkujiyan 14 hezar Êzîdî neçar man Misilmantiyê qebûl bikin.
**1911**: Osmaniyan bi destê General Farûq Paşa li dijî Êzîdî, Ermenî, Nastûrî û Qizilbaşan komkujî kir.
**1914-18**: Di Şerê Yekemîn ê Cîhanê de dema komkujiya li hember Ermeniyan hat destpêkirin, 20 hezar Ermenî ji komkujiyê reviyan û xwe spartin Êzîdiyên li Şengalê. Ji ber Êzîdiyan ev Ermenî radestî eskerên Osmanî nekirin, artêşa Osmanî Sibata 1918'an bi eşîrên Bedewî yên Ereb û eşîrên Kurd ên Misilman re êrîşî Şengalê kir û komkujiyeke nû kir.
**1918**: Êzidiyên ku ji ber komkujiyên dewleta Osmanî reviyan û xwe li Ermenîstanê girtin, li wir jî bûn hedefa êrîşan.
**1940**: Eskerên artêşa Tirk bi ser gundê Kiwexe yê ser bi Hezexê, 29 Êzîdî kirin şikeftekê û ew zindî şewitandin.
**2007**: Di Tebaxê de di komkujiya li Siba Şêx Xidir û Tilezer de li gorî hejmarêm fermî qederê 500 Êzîdî hatin qetilkirin.
**2014**: 3'yê Tebaxê bi destpêkirina êrişên DAIŞ'ê û vekişîna hêzên PDK´ê, Êzîdî rastî komkujiyê hatin. Bi hezaran ji wan hatin qetilkirin, bi hezaran jin hatin revandin û li bazaran wek kole hatin firotin. Bi sedhezaran Êzîdî neçar man Şengalê bi cih bihêlin. Ev qirkirina ku wek Fermana 74. hat terîfkirin di asta fermanan de ya herî mezin e ku hatiye serê Êzîdiyan. (Zarokên Rojê Ezîdî, Mehmet Ozcan)

Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 427 05 - Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Di meha Tîrmehê de 54 leşker û çete hatin kuştin

Navenda Raghandin û Çapemeniyê ya YPG`ê bi daxuyaniyeke nivîskî bîlançoya meha Tîrmehê ya êrîşên li ser Efrînê û çalakiyên şervanan li hember dagirkeran eşkere kir. YPG`ê diyar kir ku di meha Tîrmehê de, 54 leşkerên artêşa Tirk û çeteyên wê hatin kuştin. Her wiha YPG'ê ragihand ku 7 şevanên wan jî şehîd bûne.*R-2*



# 12 GÊRÎLAYÊN LEHENG

***Çeteyên DAIŞ'ê bi alîkariya hêzên paşverû yên herêmî roja 3'yê Tebaxa 2014'an êrîşî Şengalê kirin. 20 hezar peşmergeyên PDK'ê gelê Êzidî bê parastin di nava pencên qirkirinê de hiştin. 12 gerîlayên PKK'ê bi hawara gelê Êzidî de çûn Şengalê û bi sed hezaran mirov ji komkujiyê rizgar kirin.***



### BILA ŞENGAL XWESER BE

Bi boneya salvgera çaremîn ya êrîşên qirkirinê ya li ser Şengalê li seranserê Kurdistanê bi çalakiyên cur be cur û daxuyaniyan êrîş hatin şermezar kirin. Di çalakiyan de careke din girîngiya xwe parastin û xwe birêvirina gelê Êzidî yê Şengalê hate destnîşan kirin. Her wiha hat gotin ku ji bo careke din ev trajedî dubare nebe divê Şengal bibe xwedî statuyeke xweser.

### GERÎLA HER DEM AMADE YE

Fermandarê Biryargeha Navendî ya Parastina Gel Mûrad Karayilan jî bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Şengalê peyameke nivîskî ji bo Fermandariya Giştî ya YBŞ'ê şand. Karayilan di peyama xwe de got, "Kengî neyar êrîşî gelê me yê Êzîdî bike em ê bibin hêza parastina wan. Gelê me yê Êzîdî divê baş bizanibin gerîla her dem li pişta wan e." *R-4*

### EM Ê GELÊ XWE BIPARÊZIN

Fermandariya Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) têkildarî 4'emîn salvegera êrîşên qirkirinê yên çeteyên DAIŞ'ê ya li dijî gelê Êzidî daxuyaniyeke nivîskî weşand. Fermandariya YBŞ'ê wiha got, "Weke YBŞ em ê heta dawiyê gelê xwe biparêzin. Ji bo avakirina Iraqeke federal-demokratîk tişta ji destê me were em ê bikin." *R-4*

## Meclîsa Giştî ya Şengalê hate ragihandin





Bi boneya salvegera êrîşa li ser Şengalê ya 3'yê Tebaxa 2014'an li Şengalê çalakiya bîranînê hat lidarxistin. Rayedarên PADÊ, TAJÊ, Meclîsa Damezrîner a Şengalê û Êzidiyên li kampa Serdeştê, parlamentera Êlihê ya HDP'yî Feleknas Ûca, heyetên Suryanî, Asûrî, Keldanî yên ji Bakurê Sûriyê û Mûsilê tevlî çalakiyê bûn. Di çalakiyê de axaftin hatin kirin û Meclîsa Giştî ya Şengalê hat ragihandin. *R-2*

## 3'ê Tebaxê bibe 'Roja Qirkirina Jinan'



Koordînasyona KJK'ê bi wesîleya salvegera Qirkirina Şengalê ya 3'ê Tebaxa 2014'an daxuyaniyeke nivîskî weşand. KJK'ê bi bîr xist ku hîn jî bi hezaran jinên Êzidî êsîr in û wiha got, "Komkujiyên ku li Şengal û îro li Efrînê tên kirin encama heman zihniyetê ye û dişibin hev." KJK'ê diyar kir ku roja 3'ê Tebaxê weke Roja Qirkirina Jinan bê qebûlkirin. *R-3*

## Jin wê Ocalan azad bikin





Bi sedan welatiyên Kantona Kobanê, Girê Sipî, Sirîn li Kobanê li Qada Jina Azad bi pêşengtiya Kongreya Star ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meşek lidarxistin. Jinên ku beşadrî meşê bûn diyar kirin ku heta rêber Ocalan azad bibe ewê têkoşîna xwe dewam bikin. *R-3*

## Dewleta Tirk Êzidîyan ji wargehan derdixe

Dewleta Tirk, 5 wargehên penaberan li Dîlok, Semsûr û Mêrdînê ku Êzîdîyên ji zilma DAÎŞ'ê filitîbûn û li wan diman, vala dike. Di nav van wargehan de, wargeha AFAD'ê ya li navçeya Mîdyad a Mêrdînê ku 4 sal berî niha Êzîdiyên lê cihwar bûyî jî heye. *R-2*

## Li Efrînê 9 çete hatin kuştin



Navenda Ragihandinê ya YPG'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku şervanên wan li Efrînê di navbera 29'ê Tîrmeh û 2'ê Tebaxê de li dijî çete û leşkerên dewleta Tirk 3 çalakî lidar xistine. Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku di çalakiyan de herî kêm 9 çete û leşkerên dewleta Tirk a dagirker hatine kuştin.*R-2*

## 14 leşkerên Tirk hatin kuştin




Li bakurê Kurdistanê şer di navbera gêrîlayên HPG'ê û artêşa Tirk de dijwar dibe. Artêşa Tikr li hember çalakiyên gêrîlayan windahiyên mezin didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku li Şirnex, Colemêrg û Sêrtê gêrlayan li artêşa Tirk xistin, herî kêm 14 leşker hatin kuştin. *R-2*

## Ji ber teqîna mayîna DAÎŞ'ê 14 kesên ji Efrînê mirin



Li herêma Şêx Necar a Helebê, ji ber teqîna mayina çeteyên DAÎŞ'ê 14 sivîlan jiyana xwe ji dest dan. Hate ragihandin ku kesên jiyana xwe ji dest dayî 3 jê ji gundê Îska, 3 ji gundê Birc Qas, 7 jê ji gundê Molana û 1 jî ji gundê Basilê ye. *R-2*

## Li nav kavilan perwerdeyê dibînin



Piştî ku bajarê Efrînê hat dagirkirin dibistan hatin rûxandin, zarokên Efrînê yên li herêma Şehbayê dîsa careke din dest bi perwerdeya xwe kirin. 723 zarokên Efrînê li Dibistan Ehdes ya ku ji ber şer ruxyaye û rêjîm û çeteyan weke navendên xwe jî bikaranîne, dest bi perwerdeya xwe kirine. *R-6*

# Meclîsa Giştî ya Şengalê hate ragihandin

***Bi boneya salvegera êrîşa li ser Şengalê ya 3'yê Tebaxa 2014'an li Şengalê çalakiya bîranînê hat lidarxistin. Rayedarên PADÊ, TAJÊ, Meclîsa Damezrîner a Şengalê û Êzidiyên li kampa Serdeştê, parlamentera Êlihê ya HDP'yî Feleknas Ûca, heyetên Suryanî, Asûrî, Keldanî yên ji Bakurê Sûriyê û Mûsilê tevlî çalakiyê bûn. Di çalakiyê de axaftin hatin kirin û Meclîsa Giştî ya Şengalê hat ragihandin.***

Şêniyên Şengalê di salvegera çaremîn a Qirkirina 3'ê Tebaxa 2014'an de Meclîsa Giştî ya Şengalê ragihandin.
Bi boneya salvegera êrîşa li ser Şengalê ya 3'yê Tebaxa 2014'an li Şengalê meşeke girseyî hat lidarxistin. Rayedarên Partiya Azadî û Demokrasiyê ya Êzidiyan (PADÊ), Tevgera Azadiyê ya Jinên Êzîdxanê (TAJÊ), Meclîsa Damezrîner a Şengalê û Êzidiyên li kampa Serdeştê, parlamentera Êlihê ya HDP'yî Feleknas Ûca, Berpirsyarê Partiya Bêt Nahrên a Suryaniyan Yûsûf Yakûp û heyetên Suryanî, Asûrî, Keldanî yên ji Bakurê Sûriyê û Mûsilê hatin tevlî çalakiyê bûn.
Jin û zarokên ji nava lepên DAÎŞ'ê rizgar bûn, yên ku hîn xizmên wan dîl girtî ne û Şengaliyên piştre li cih û warê xwe vegeriyan cihê xwe li refên pêş ên meşê girtin.
Di meşê de wêneyên jin û zarokên di komkujiyê de dîl hatin girtin, hatin hildan û dirûşmên "Bimre Xiyanet", "Bijî Serok Apo" hatin qîrîn.
Girseya gel dema ku gihîşt ber avahiya Meclîsa Xweseriya Demokratîk a Şengalê nûnerê PADÊ axivî û destnîşan kir ku Êzidî êdî civakeke azad e û amade ye.
Parlamentera Êlihê ya HDP'yî Feleknas Ûca jî bi navê KCD, DBP û HDP'ê axivî û diyar kir ku gelê Şengalê bi tenê nîne, hemû Êzidiyên li çar parçeyan pê re ne. Ûca destnîşan kir ku wê kiryarên DAÎŞ'ê ti carî ji bîr nekin û diyar kir, heta ku jin û zarokên êsîr bên rizgarkirin wê têkoşîna xwe bidomînin.
Ûca işaret bi girîngiya pêkhatina yekîtiya Êzidiyan kir û got, "Ji bo naskirina vê fermanê me gelekî




hewl dan, lê bersiva neyînî hate dayin. Cîhan tev li pêşberî vê qirkirinê bêdeng ma. Ancax em dikarin xwedî li hev derkevin. Ji bo vê jî divê em yekîtî û têkoşîna xwe geş bikin. Heta ku em jinên xwe yên di destê wan de ne rizgar bikin, sekn wê li me nebe."
Piştî axaftinan damezrandina Meclîsa Giştî ya Şengalê hate ragihandin.

## Di meha Tîrmehê de 54 leşker û çete hatin kuştin

Navenda Raghandin û Çapemeniyê ya YPG`ê diyar kir ku di meha Tîrmehê de, 54 leşkerên artêşa Tirk û çeteyên wê hatin kuştin.
Navenda Raghandin û Çapemeniyê ya YPG`ê bi daxuyaniyeke nivîskî bîlançoya meha Tîrmehê aşkere kir.
Daxuyaniya YPG`ê wiha ye:
"Dewleta Tirk a dagirker bi sala 2018'an re, li hember şoreşa Rojava lez daye şerê qirkirinê, ev şerê xwe zivirandiye tevgerek dagirkirinê. Bi dagirkirina Efrînê re qirkirin gihandiye asta herî jor û gûherandina demografiya Efrînê kiriye armanc, biryar daye ku herêmê bê Kurd bihêlin.
Li hember feraseta faşîzan û êrîşa dagirkeriyê a dewleta Tirk û çeteyên wê yekîneyên me bi çalakiyên bi bandor li hêzên dagirker xistine. Encamên şer û çalakiyên di meha Tîrmehê de hatine lidarxistin wiha ye;



1. Di meha Tîrmehê de hêzên me li hember artêşa Tirk û çeteyên girêdayê wan 22 çalakiyên bi bandor lidarxistine. Di çalakî û pevçûnên di meha Tîrmehê de hatiye jiyîn 54 leşkerên Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê hatine kuştin. Di pevçûnên ku hatine jiyankirin de bi giştî 7 hevalên me bi qehremanî şer kirine û gihiştine şehadetê.
2. Di şerê Bagera Cizîrê de jî a di pêşengiya Hêzên Suriya Demokratîk (QSD) û bi tevlîbûna aktif a hêzên me YPG-YPJ li hember çeteyên DAIŞ'ê de di meha Tîrmehê berdewam kiriye û pêşveçûnek mezin jî çêbûye. Di encama meha Tîrmehê de operasyon û pevçûnan de ya li bejahiya Dêrazor de hevalek me gihiştiye şehadetê. Jiber ku encamên vê şerî ji aliyê Ragihandina QSD'ê ve bi awayek berfireh hatiye aşkerekirin.

## 14 leşkerên Tirk hatin kuştin



Gerîlayên HPG'ê li Şirnex, Colemêrg û Sêrtê li artêşa Tirk xistin. Di çalakiyan de herî kêm 14 leşker hatin kuştin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser mijarê ev daxuyanî da:
Artêşa TC a dagirker bi desteka balafirên keşfê yên bê mirov û wesayitên zirxî roja 2'ê Tebaxê li herêma gundên Şavte, Sêkranê û Şêrvanê dest bi operasyonê kir. Hêzên me heman rojê saet 11:30'î li dijî yekîneyeke operasyonê çalakiyeke sabotajê kirin. Di çalakiyê de leşkerekî dijmin hate kuştin.
Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de roja 1'ê Tebaxê saet 02:10'an li herêma Navyana Şêxa ya Şirnexê li dijî yekîneyeke artêşa TC a dagirker a li ser girekî nêzî Girê Misto bû, çalakiyek pêk anîn. Ji çar baskan ve li çeper û stargehên dijmin hate xistin û 8 çeperAên dijmin ên li ser gir bi temamî hatin rûxandin. Cebilxane û dozereke li ser gir jî hatin rûxandin. Di çalakiyê de 11 leşkerên dijmin hatin kuştin û gerîlayên me çûn ser hemû cenazeyan. Çekek BKC jî ji ser cenazeyên leşkeran hate rakirin.
Sibeha 2'ê Tebaxê di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de li dijî leşkerên li ser girê Şehîd Sorxwîn çalakiyek hate kirin. Bi derbên xurt 2 leşkerên dijmin hatin kuştin.

## Li Efrînê 9 çete hatin kuştin

Li Efrînê di çalakiyên şervanên YPG/YPJ'ê de herî kêm 9 çeteyên dewleta Tirk a dagirker hatin kuştin.
Navenda Ragihandinê ya YPG'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir ku şervanên wan li Efrînê di navbera 29'ê Tîrmeh û 2'ê Tebaxê de li dijî çete û leşkerên dewleta Tirk 3 çalakî lidar xistine.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku di çalakiyan de herî kêm 9 çete û leşkerên dewleta Tirk a dagirker hatine kuştin.
Li gorî daxuyaniyê şervanên YPG/YPJ'ê roja 29'ê Tîrmehê li herêma di navbera gundên Fafirtîn û Birc Heyder yên girêdayî navçeya Şêrawa ya Efrîn'ê wesayîteke leşkerî ya çeteyên Ehrar Şam bûye armanc. Di çalakiyê de wesayîta leşkerî hatiye rûxandin, hejmara kuştî û birîndaran nehatiye tespîtkirin.
Di dewama daxuyaniyê de hate gotin ku roja 30'ê Tîrmehê hêzên YPG/YPJ'ê li gundê Basûtê yê girêdayî navçeya Şêrawa bi motoreke bombebarkirî kombûneke çeteyên koma çete ya bi navê Hemze kirin armanc. YPG'ê diyar kir ku di encama çalakiyê de leşkereke artêşa Tirk a dagirker û 4 çete hatine kuştin. Her wiha leşkerek û 2 çete jî brîndar bûne.
Di dawiya daxuyaniyê de hate gotin ku 2'ê Tebaxê şervanên YPG/YPJ'ê li gundê Kîmarê yê girêdayî navçeya Şêrawa li dijî wesayîteke leşkerî ya çeteyan kemînek danin. Di encama çalakiyê de leşkereke artêşa Tirk a dagirker û 3 çete hatine kuştin, 2 çete jî birîndar bûne.

## Dewleta Tirk Êzidîyan ji wargehan derdixe

Dewleta Tirk, 5 wargehên penaberan ku Êzîdîyên ji zilma DAÎŞ'ê filitîbûn û li wan diman, vala dike.
Gerînendeya Giştî yê Îdareya Koçberiyê ya girêdayî Wezareta Karê Hundir ê Tirk, ragihand ku wê 5 wargehên penaberan ên li Dîlok, Semsûr, û Mêrdînê vala bikin. Gerînendeyê biryar da ku wê 34 180 penaberên li van wargehan dimînin veguhêzin li wargehên Hatay, navçeyên Rihayê Kaniya Xezalan, Pirsûs û Serêkaniyê.
Di nav van wargehan de, wargeha AFAD'ê ya li navçeya Mîdyad a Mêrdînê ku 4 sal berî niha Êzîdiyên ji zilma DAÎŞ'ê xaka xwe terikandibûn û lê cihwar bûyî jî heye. Hate ragihandin ku ji sedî 90 Êzîdiyên li wargehê dimînin anîne ziman ku bi derfetên xwe ji wargehê veqetin û li gundên Êzîdiyan ên li herêmê cihwar bibin.

## Ji ber teqîna mayîna DAÎŞ'ê 14 kesên ji Efrînê mirin

Li herêma Şêx Necar a Helebê mayina çeteyên DAÎŞ'ê teqiya. 14 sivîlan jiyana xwe ji dest dan.
Li herêma Şêx Necar a Helebê, ji ber teqîna mayina çeteyên DAÎŞ'ê 14 sivîlan jiyana xwe ji dest dan.
Sivîlên jiyana xwe ji dest dane: Elî Mihemed Şebo (65) û hevjîna wî Zelûxa (55), Elî Elî Şebo (30), Elya Mûstafa Şebo (25), Mûstafa Suleyman Terko (75), Hîvîn Elî Şebo (9), Oso Ednan, Fehîme Mustafa Bekir, Xezalê Ebûd Erbo, Nîdal Hemed, Elî Mihemed Hisên, Elîsara Oso Ednan.
Hate ragihandin ku kesên jiyana xwe ji dest dayî 3 jê ji gundê Îska, 3 ji gundê Birc Qas, 7 jê ji gundê Molana û 1 jî ji gundê Basilê ye.
Cenazeyên kesên jiyana xwe ji dest dayî rakirin morga nexweşxaneya Helebê.





# Li Til Koçer komên hunerî ava bûn

***Xebatên çand û hunerê yên li herêma Cizîrê berdewam dikin. Piştî şervanên YPG û YPJ'ê di 26'ê Cotmeha 2013'an de bajarok ji çeteyên Cebhet El-Nusra rizgarkirin, xebatên çandî jî ji nûve hatin destpê kirin. Navenda Çand û Hunerê ya bajarokê Til Koçer gavek girîng avêt û ji 134 kesan komên hunerî ava kirin.***



Navenda Çand û Hunerê ya bajarokê Til Koçer gavek ji bo vejandina çand û hunera Erebî de, avêt û ji 134 kesan komên hunerî ava kirin.
Li bajarokê Til Koçer di dema rêjîmê de rola çand û hunerê hatibû paşguhkirin û di dema Cebhet El-Nusra de bi temamî hat rewastandin.
Piştî şervanên YPG û YPJ'ê di 26'ê Cotmeha 2013'an de bajarok ji çeteyên Cebhet El-Nusra rizgarkirin, meclisên herêmî û komîteyên xizmetî ji bo ji nû ve vejandina bajarok hatin avakirin.


### YEKEMÎN NAVENDA ÇAND Û HUNERÊ

Navenda çand û hunerê di dawiya sala 2016 'an hate vekirin. Navend ji bo vejandina çand û hunera Erebî û her wiha çandên cuda yên gelên bajarokê bi rêxistin kir.
Mamosteyê şanoyê yê Navenda Çand û Hunerê ya Til Koçer Ednan Mistefa destnîşan kir ku ev navend di dîroka bajarokê de ya yekemîn e û wiha got: "Ev gav ji bo bajarok li ser her du astan a hunerî û çandî, wekî gaveke dîrokî ye. Ji ber ku tu navendeke çandî li bajarok tune bû."
Endamê Rêveber ê Navenda Çand û Hunerê ya Til Koçerê Mazlûm Elî diyar kir ku şêniyên bajarokê ji ber qalib û kevneşopiyên êlan û bandora ola îslamê li ser wan, şerm dikirin ku zarokên xwe bişînin navendê û wiha got: "Niha piştî keda endamên navendê bi rêya lidarxistina civînan û serdana malên şêniyên bajarok, şêniyan ew qalib şikandin û niha hêdî hêdî serdana navendê dikin."

### AVAKIRINA KOMÊN HUNERÎ

Navend ji destpêka avabûna xwe de 134 endam bi rêxistin kirin, kom ji wan ava kirin. Komên hatin ava kirin wiha ne: Koma Zarokên Aştiyê 100 zarok di nav de şano, stran, govend. Koma Ş. Uqab a govendên gelêrî 10 ciwan. Koma El-Cezîrê ya stran û govendê 13 ciwan. Koma Ş.Ezîz a şano 11 kes di nav de 6 jin in.
Mazlûm Elî û rêveberê Koma Ş. Uqab Şengal a govendên gelêrî Mişel Hisên diyar kirin ku wan ji bo vejandina çand û hunera Erebî ya kevn û parastina wê ji windabûnê dixebitin û destnîşan kirin ku ji ber wê wan gelek govendên weke (çopî çolaqî, debkê Ereban) û her wiha govendên gelêrî yên kevn li şahiyan de pêşkêş kirin.
Her wiha navend ji bo pêşxistina hunerî ya endaman, dewreyên perwerdê yên teorî û piratîk ji şêwazên hunerî weke nîgar, karê destan vedike. Navend ji bo zarokên asta seretayî di havînê de dewreyên perwerdê ji bilindkirina asta wan a çandî vekir.
Endamê rêveber ê navenda





MAzlûm Elî diyar kir ku rêjeya tevlêbûna jinan a navendê ji rêya xortan ji sedî 60 zêdetir e. Li ser pergala perwerdekirina koman, Elî diyar kir ku her komek di hefteyê de 3 caran li gorî beşa xwe perwerde dibe.

### STRANEK JI BO ZAROKÊN EFRÎNÊ


Ji bo pêkanîna yekîtiya gel li Bakurê Sûriyê li gorî bingeha jiyana hevbeş û biratiya gelan, Koma Zarokan a Aştiyê li ser strana bi navê "Efrîn ji te re aşitî" perwerde dibin. Koma zarokan vê stranê diyarî berxwedana serdemê û şêniyên Efrînê dikin ên ku li hember artêşa tirk û çeteyên wê 58 rojan bi lehengî li ber xwe dan. Koma zarokan strana xwe di Mîhrîcana Zarokan a ku piştî çend mehan li ser asta Cizîrê were lidarxistin wê pêşkêş bike…*ANHA*

## Li Reqayê pêşengeha wêneyan hat vekirin



Komîteya Çand û Hunerê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê pêşengehek wênasaziyê vekir. Vekirina pêşengehê wekî gavekê ji bo vejandina huner û wênesaziyê tê dîtin.
Bi dirûşma "Bijî Reqa" Komîteya Çand û Hunerê ya girêdayî Meclisa Sivîl a Reqayê pêşengeheke tabloyên wênesaziyên ku şêwekarên Reqayê beriya 2011'an xêzkiribûn, vekir.
Bi rizgarkirina bajarê Reqayê ji aliyê QSD'ê ve ji çeteyên DAIŞ'ê hunermend û şêwekarên Reqayê berhemên ku xwe yên ku bi salan hatibûn temirandinê êdî bi azad û bi destekdayîna Meclisa Sivîl a Reqayê berhemên xwe derdixînin.
Di pêşengehekê de ku ji aliyê Komîteya Çand û Hunerê ya Meclisa Sivîl a Reqayê ve li hola avahiya Rêveberiya Sivîl a Demokratîk Reqayê hatibû organîzekirin 25 tablo ku tê de qala edet û çanda gelê Reqayê dike, hatin pêşkêşkirin.
Şêwekarê bi navê Ehmed El-Cilid ku beşdarî pêşengehê bûye îşaret bi tabloyeke xwe kir û got, "Ev tablo min ji sala 2011'an de xêz kiriye, ji tirsa çeteyên DAIŞ'ê ku şerê çand û hunera bajarê Reqayê kiribû min veşartibû."
Şêwekar bang li hemû hunermendan kir ku vegerîn warê xwe û beşdarî ji nû ve avakirina Reqayê bibin…*ANHA*

## Pêşengeha kevneşopiyê hat lidarxistin



Di çarçoveya çalakiyên hefteya çandê de ku ji aliyê Tevgera Kevana Zêrîn a Kantona Efrînê ve hatiye organîzekirin pêşengeheke alavên kevin li gundê Aqîbê yê navçeya Şêrawa ya kantona Efrînê bi amadebûna sedan kesî hate vekirin.
Di çarçoveya çalakiyên hefteya çandê de ku ji aliyê Tevgera Kevana Zêrîn a Kantona Efrînê ve hatiye organîzekirin pêşengeheke alavên kevin li gundê Aqîbê yê navçeya Şêrawa ya kantona Efrînê bi amadebûna sedan kesî hate vekirin. Di pêşengehê de hemû tiştên kevneşopî, cilên dîrokî û wêneyên kesayetên kevnar hatin pêşkêşkirin.
Piştî deqeyek rêzgirtinê ya ji bo pakrewanên azadiyê, li ser navê Çand û Huner ya navçeyê Şêrewa Henan Osman axivî û got: "Çand û huner nasnemeya gelan e. Em ê ji bo nasnameya xwe her têbikoşin."
Paşê ji aliyê kulîlkên kurdistanê ve Nisrîn Kil Dedu, Fîdan Hebeşo û netewan Silêman helbest hatin xwendin. Piştre koma Şehîd Baran Dîtran ya stranan stran pêşkêş kirin. Paşê Koma Şehîd Ciwan ya govendê govendên kevneşopî pêşkêş kirin.



## Pişavtin-Assimilation

Sîpan ŞÎNDA

Qêrînek tê ji geliyên kûr, gelo kî dibihîse, nalînek tê ji birînên xedar, gelo kê hayî jê heye!
Peyveka ji bo Kurdan pirr girîng, li ber dilê min yek jê pişavtin ango assîmîlatîon e. Pişavtin: Ji aliyê pergalên desthilatdar ve tine kirina çand, nasname, ziman û heyînên nijad û netewên cida, ji pêvajoya helandin û ji holê rakirina van heyînan re pişavtin tê gotin. Pişavtin, ji aliyê pergalên serdest û zordar ve bi rê û rêbazên cida tê kirin. Lê du rêbazên bingehîn hene; yek pişavtina bi darê zorê, yek ji a sîstematîk e. Di vir de pirrê caran ev herdû rêbaz bi hev re tên şixwilandin. Ji aliyekê ve desthilatdar û zilimkar bi riya hîmên pergalê weke dibistan, televizyon, rojname, pirtûk, video, reklam, înternet û hwd asîmîlasyona sîstematîk dikin. Ev rêbaz ji bo kom, nijad û netewên tên pişavtin kirin a herî tehlûke ye. Ji ber ku rêbazeka nerm e û xîtabî binhişiya mirovan, civakê dike. Bi taybetî ji bona zarokan bêxin di vê xefka henê de, rê û rêbazên li gor temenê wan û bala wan bikişînin bikar tînin. Encamên vê rêbazê dûvdirêjin û armanca vê rêbazê raste rast mejî û hestên kesan, koman, netewanin. Rêbaza duyem ji ya bi darê zorê ye. Di vê rêbazê de çav tirsandin, girtin, kuştin, talan kirin, êşkence, koçber kirin, mal xirab kirin û hwd hene. Ev rêbazeka hişk e. Ji ber kû ev rêbaz hişk e, zû bi zû encam nagire, yan ji encamên wê bê domin. Ev rêbazeka girbere, ji ber wê di nava kom, nijad, netewên tên pişavtin de bertekên nerazîbûnê zêdetir derdikevin.
Pişavtin ne karê rojekê, mehekê yan ji salekê ye. Karekî bi deh salan, sed salan dom dike. Di assîmîlationê de pergal du rû ye. Di serî de pergal rûyê xwe yê şirîn, nerm dide xwiya kirin. Rêbaz ji eve: Her tişt ji bo we û qenciya we ye! Lê ya rast ne eve. Zor û zextê li ser çand, ziman û heyînên wan komên tên pişavtin dike. Çanda wan weke çandeka şûnde mayî dide xwiya kirin. Mejî û hestên wan tevilhev dike. Ew kom ji her tim xwe di bin zor û zextê de hîs dikin. Armanca pişavtinê ya bingehîn a polîtîk, tine kirin û ji holê rakirina çand û netewên cida ye, ava kirina çand û neteweka yekane ye. Pergala desthilatdar dixwaze hemû cidahiyên di nava civakê de ji holê rake û çand û neteweka yekdest biafirîne. Ev jî, ji bo wan çand û netewa desthilatdar e. Di vê pêvajoyê de netewên li rastî pişavtinê tên di nava demê de çand û zimanê xwe winda dikin û di taliyê de jî kesayetiya xwe winda dikin. Pergal, ji bona serbikeve di serî de zimanê xwe li ser kom, nijad û netewên bindest ferz dike. Di nava demê de ew kom, netew ji vê yeka henê dipejirînin. Mixabin bi vî hawî gelik ziman ji ser rûyê gerdûn winda bûne. Ji van zimanên îro di bin vê tehlûkê de yek jê zimanê Kurdî ye. Iro her çend li başûrê Kurdistanê zimanê Kurdî weke zimanekî fermî tê bikaranîn û herweha bûye zimanê perwerdehiyê ji, bes li bakûr û rojhilat ev tişt nîne. Li rojava bi awayekî de facto heye lê hêj ji aliyê rejîma desthilatdar ve nehatiye pejirandin. Fîlozofê Elmanî Ludwig Wittgenstein dibêje: Tixwîbê zimanê min tixwîbê dinya min e.

# Li nav kavilan perwerdeyê dibînin

**Piştî ku bajarê Efrînê hat dagirkirin dibistan hatin rûxandin, zarokên Efrînê yên li herêma Şehbayê dîsa careke din dest bi perwerdeya xwe kirin. 723 zarokên Efrînê li Dibistan Ehdes ya ku ji ber şer ruxyaye û rêjîm û çeteyan weke navendên xwe jî bikaranîne, dest bi perwerdeya xwe kirine.**



Zarokên Efrînê ji bo fêrî zimanê xwe bibin û ji xwendina xwe qut nebin, li nav kavilan û li ser hesîran dixwînin.
Li koçberiyê di nav kavilan de 723 zarokên Efrînê tenê ji bo fêrî zimanê xwe bibin, têne wê dibistanê. Dibistana Ehdase; di wextê rejîmê de girtîgeha zarokan a Helebê bû û çeteyên DAIŞ`ê jî di navbera salên 2014-2015`an de wek navend bi kar anîn. Jixwe heyanî ku ev herêm rizgar dibe girtîgeha Ehdas ji gelek aliyên xwe ve di encama şer de dirûxe û gelek ziyan dibîne.
Dibistan 6'ê Hezîranê vedibe û zarokên Ehdasê 500 m dimeşin heyanî digihîjin dibistanê. Li dibistana Ehdas şagirtên refa yekemîn heyanî refa 12`emîn dixwînin. Şagirtên dibistana seretayî saet di 07:30'an berê xwe didin dibistana xwe. Derfet kêm in û ew zarok neçar dimînin heyanî saet 11:002'an di bin wan kavilan de û li ber germahiya rojê bixwînin.
Şagirtên dibistana navîn û amadehî jî, ji saet 15:00'an diçin dibistana xwe û heyanî saet 17:00'an dixwînin. Li ser materyalên Rêveberiya Xweser û ji refê 4`emîn êdî şagirt li gel zimanê kurdî fêrî zimanê Erebî, Fransî û Îngilîzî dibin.
Materyal weke pirtûk ne tenê li gel şagirtan, di destê hemû mamosteyan de jî nînin û hejmareke mezin ji mamosteyan materyal girtine ser telefonên xwe û ders didin şagirtan.
Zarokên Efrînê yên di encama dagirkeriya dewleta Tirk koçberî herêma Şehba bûn hesîr li refên xwe yên bê derî û pencere radixînin û bi mereq li mamosteyên xwe guhdar dikin.
Ezmûnên dibistana seretayî bi dawî bûne yên refa 7, 8,10 û 11`emîn jî ji 1`ê mehê heyanî 10`ê mehê didomin û refên 9 û 12`emîn jî wê 11`ê mehê dest bi ezmûnên xwe bikin… *ANHA*

## Gelek zarokên mîna Esed hene lê, çare çiye...



**Ferîşte NEZÎR**

Tevî ku dewletên navnetewî ji bo qedexekrina karkirina zarokan biryar girtine lê, hîn jî di civaka me de bi sedan mîna zarokê Esed hene ku ji bo debara mala xwe dixebitin. Ev diyardeya karkirina zarokan bandorek neyînê bi gelemperî û civakî û taybet ser zarokan dike, ji ber ku ew zarok ne di milê hişmendî û ne jî bedenî ji xebateke giran amedeye, ji ber ku ev kar bandorê li tendrustî, baedenî û hînkirina wî bandorek neyînî ava dike. yek ji van zarokên ku bi temenê bi çûk dixebitin zarokê bi navê Esed Lazgîn, ser sedema xebtakirinê ev tişt anî ziman ku raste ez temen bi çûkum lê, ji bo ku debara xwe ya jiyanî bikim û mesrefa xwendina xwe bikim ez kardikim, ez bi vî temenî kar bikim bsaştire ku destê xwe li kesî vekim."

**JÎ BO DEBARA MALABATA XWE DÎXEBÎTE**

Zarokê bi navê Esed Lazgîn Elî ji bajarê Qamişlo taxa Xerbî dijî bi temenê xwe 14 salî di refa 8'an de ye, ev sê salin ku karê firotina biskewîtan dike. Esed piranî di demsla havînî de ji bo debara xwe li tax û kolanan piskewîtan difroşe, her wiha da ku mazemeyîn xwendinê bikirinê, ji ber ku dema zivistanê ango demsla xwendinê de diçe dibistanê."

**JÎ ÎHMALÎ RASTÎ MÎNA VAN BÛYERAN TÊN**

Di çaroçoveya encama ihmaliya bav de ku dev ji xaka xwe berdeaye û reviya ye Tirkî em rastî rewşek wiha tên, ku di malbata Esed de 8 keç û 4 xorthene 5 keç jê zewicîne û 2 birayê wî cihê xwe di nav refên YPG de digrin. Esde da da zanîn ku ku ew vî karê firotina biskewîtan ji bo xwe dike da ku di milê madî de bi malbata xwe re alîkare be, her wiha bi vî rengî ez dikarim bi pereyên qezanc dikim da ku alavên dibistanê ji xwere bikrim."

**DESTÊ XWE LÎ BER KESÎ VENA KÎM**

Esed ji dem jimêra 10'ê sibehê heya nîvro û ji êvarî heya derng dimîne, her wiha li gorî rewş û tevgera mirovan qezanacam min cûda ye. Yanî di rojê de ji 500 heya 100 P.S qezanc dikim, lê ya girîn ku ez destê xwe ber kesî venekim, bi ked û xwehdana xwe vî karî dikim."

## Li Sûka Salihiyê her tişt heye



Di sûka Salihiyê ya kevn de her tişt peyda dibe û buha ji yên dikan û herêmên din erzantir e, lewre bûye hêviya şêniyên taxên rojhilatê bajarê Hesekê. Froşkarên seyar bang li aliyên têkildar dikin ku sûkê ji nû ve sererast bikin û siwanan deynin.
Sûka Salihiyê ya kevn, ji beriya 15 salan ve hatiye avakirin û bûye hêviya şêniyên taxên rojhilatê bajarê Hesekê; Ezîziyê, Miftî, Salihiya Başûr, Salihiya Bakur, Xeşman û Telayî. Di vê sûkê de her tişt peyda dibe û bi buhayê wê ji dikanên taxên din erzantire.
Tevgera li sûka Salihiyê ji saetên sibehê 07:00'an de dest pê dike.
Fatîma Îsa ji taxa Ezîziyê ye, diyar kir ku ew rojane tê vê sûkê û pêwîstiyên dikire û diyar kir ku buhayê madeyan li vê sûkê li bermaberî cihên din kêmtir e.
Welatiya bi navê Fatima Elî Ehmed ya ji taxa Salihiyê anî ziman ku ji ber danûstanên xwe yên ji aliyê dikandaran ve diçe vê sûkê. Fatima bang li aliyên têkildar kir ku buhayên madeyan kontrol bikin.
Firoşkarê bi navê Yasir Emar jî bang li aliyên têlidar kir ku sûkê sererast bikin û sîwanan deynin… *ANHA*

## Ciwanên Bakurê Sûriyê tûrnûvaya futbolê wê lidarbixin

Buroya Ciwanan a Meclisa Sûriya Demokratîk civîna xwe lidarxist û di civînê de biryar hat girtin ku li ser asta Bakurê Sûriyê di çarçoveya çalakiyên pêngava "Serî Hilde" turnuvaya futbolê lidarbixin.
Buroya Ciwanan a Meclisa Sûriya Demokratîk li navçeya Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî civînek li dar xist. Yekitî û buroyên werzîşê yên Bakurê Sûriyê bi armanca birêxistinkirina turnuvaya futbolê tev li civînê bûn.
Bi însiyatîfa Yekitiya Ciwanên Rojava (YCR) û bi dirûşma "Serî hilde, şer bike û Efrînê rizgar bike" û di çarçoveya pêngava duyemîn a hemleya "Serî Hilde" de ku di 9`ê Hezîranê de hate destpêkirin wê turnuvaya futbolê were lidarxistin.
Di civînê de nîqaş li ser lidarxistina turnuvaya futbolê li ser asta Bakurê Sûriyê hatin kirin.
Her wiha kesên beşdar li ser çawaniya hilbijartina tîman û cihên ku turnuve lê were lidarxistin, pêşniyar kirin.
Di dawiyê de komîteya amadekar a turnuvayê hate hilbijartin.
Komîte ji 7 endaman pêk tê.
Komîte wê di nava çend rojên pêş de cih û dema turnuvayê diyar bike.
Di vê çarçoveyê de hevserokê Meclisa Ciwanên Sûriyê Yûsif Xilewî diyar kir ku wan hemû nûnerên buro, komîte û yekitiyên werzîşê yên Bakurê Sûriyê dawetî nîqaşên li ser lidarxistina turnuvayê kirine da ku hemû bajarên Bakurê Sûriyê tev li turnuvayê bibin…*ANHA*





# 3'ê Tebaxê bibe 'Roja Qirkirina Jinan'

***Koordînasyona KJK'ê bi wesîleya salvegera Qirkirina Şengalê ya 3'ê Tebaxa 2014'an daxuyaniyeke nivîskî weşand. KJK'ê bi bîr xist ku hîn jî bi hezaran jinên Êzidî êsîr in û wiha got, "Komkujiyên ku li Şengal û îro li Efrînê tên kirin encama heman zihniyetê ye û dişibin hev." KJK'ê diyar kir ku roja 3'ê Tebaxê weke Roja Qirkirina Jinan bê qebûlkirin.***



Koordînasyona KJK'ê bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Şengalê daxuyaniyek da û got, "3'ê Tebaxê weke Roja Qirkirina Jinan bê qebûlkirin."
Koordînasyona KJK'ê bi wesîleya salvegera Qirkirina Şengalê ya 3'ê Tebaxa 2014'an daxuyaniyeke nivîskî weşand. KJK'ê bi bîr xist ku hîn jî bi hezaran jinên Êzidî êsîr in.
Koordînasyona KJK'ê da xuyakirin ku li gel komkujî û fermanan civaka Êzidî heta niha xwe parastiye û polîtîkayên asîmîlasyonê û rêvebirina ji aliyê desthilatdariyên serdest ve qebûl nekiriye.
Di daxuyaniyê de hate gotin, "Piştî ku PDK'ê Şengal terikand, zîhniyeta faşîzma reş a DAÎŞ'ê 3'ê Tebaxa 2014'an êrîş bir ser Şengalê û qirkirina 74'an li civaka me ya Êzidî hate kirin. Bi fermana 74'an re kiryarên qirkirinê yên herî hov ên li dijî mirovahiyê careke din li ser civaka me ya Êzidî hatin ferzkirin, bi hezaran Êzidî hatin kuştin, bi hezaran jin weke xenîmet hatin revandin û bi hezaran neçar hatin hiştin ku cih û warê xwe biterikînin."
Koordînasyona KJK'ê diyar kir ku Derwêşên hemdem û donzdeh şervanên bi pêşengiya PKK'ê li dijî fermana 74'an dest bi şerê xweparastinê kirin û pêşî li fermanê girtin. KJK'ê destnîşan kir ku civaka Êzidî li ser vê bingehê li Şengalê ma û hebûna xwe lê dewam kir.
KJK'ê êrîş û revandina bi hezaran jinên Êzidî weke êrîşa li dijî azadiya jinên li Rojhilata Navîn û gelemperiya cîhanê bi nav kir û wiha dewam kir: "Bi komkujiya li jinên Êzidî kirin re xwestin, xeta azadiyê ya jinê qels bikin û çavê jinan bitirsînin."
KJK'ê da xuyakirin ku li Efrînê komkujiyên ku bi serkêşiya dewleta Tirk li dijî jinê hatin kirin, encama heman zîhniyeta DAÎŞ'ê ye û got, "Komkujiyên hatin kirin dişibin hev.Di serî de jinên Êzidî, rêxistinkirin û xweparastina hemû jinan wê bersiva herî mezin a li vê yekê be.
3'ê Tebaxê roja destpêkirina fermana li Êzidiyan rabû, divê bibe roja têkoşîn, rêxistinbûn, piştevanî û berxwedanê. Girîng e 3'ê Tebaxê bibe roja geşkirina xweparastin, rêxistinbûn û têkoşîna hevpar a hemû jinên cîhanê bi taybetî jinên Êzidî."

## Em ê dagirkeran ji Efrînê derxînin







Jinên êzidî yên Efrînê diyar kirin ku her hêzeke ku dixwaze nasnameya gelekî ji holê rake, di serî de êrîşî jinan dikin. Jinanên Êzidî yên Efrînê destnîşan kirin ku wê têkoşîna xwe mezin bikin heta Efrînê rizgar bikin.
Jinên êzidî yên Efrînê têkildarî salvegera 4'emîn a qirkirina Êzidiyan axivîn.
Leyla Şamo komkujiya li dijî gelê kurd ê Êzidî bi bîr anî û wiha axivî: "Gelê Şengalê beriya 4 salan rastî êrîşeke hovane ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hat. Gelek hêzan piştgirî dan vê êrîşa li hovane ya li ser Şengalê. Ji ber çand û baweriya gelê Êzidî ditirsin êrîş dikin. Hewl didin bi êrîşan civaka Êzidî tune bikin."
Xatûn Ebdo bal kişand ser hevkariya çeteyên DAIŞ'ê û dewleta tirk û kiryarên wan ên li dijî jinan û wiha pê de çû: "Dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê li Efrînê berdewam dike. Tirkiye bi awayekî eşkere destekê dide komên çete da ku gelê kurd bi giştî û Êzidiyan tune bikin. Lewre divê civaka navdewletî, raya giştî hesabê komkujiya Şengalê bixwaze û dagirkeriya Tirkiyê ji Efrînê derxin beriya ku komkujiyeke din li dijî gelê Êzidî pêk were.
Qiret Betal îşaret pê kir ku êrîşên artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê yên li ser Efrînê berdewama komkujiya jinên Şengalê ye û wiha got: "Êdî jinên Efrînî asta hovîtiya dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê nas kirin, ji ber vê yekê ji Efrînê derketin da ku nekevin destê wan. Em ê têkoşîna xwe berdewam bikin heta Efrînê ji dagirkeran rizgar bikin."

## Jin wê Ocalan azad bikin

Rêxistina Kongreya Star bi dirûşma " Azadiya Rêber Apo Azadiya Jin û Civakê ye" ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan meşek girseyî lidarxistin. Jinên ku beşdarî meşê bûn gotin: "Heta Rêber Apo azad nebe em nasekinin."
Bi sedan welatiyên Kantona Kobanê, Girê Sipî, Sirîn li Kobanê li Qada Jina Azad bi pêşengtiya Kongreya Star bi dirûşmên "Bê Serok jiyan nabe" Jin jiyana azadî", "Azadiya Rêber Apo Azadiya jin û civakê ye" meş li dar xistin. Di meşê de wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, hat hilgirtin. Li ser navê Rêveberiya xweser Enwer Muslim û li ser navê Kongreya Star a Kantona Girê Sipî jî axaftîn hatin kirin. Jinên ku beşdarî meşê bûn anîn ziman ku ji bo aşitî û azadiyê divê Abdullah Ocalan azad bibe.




Emîne Ehmed diyar kir ku ew ji bo azadiya Abdullah Ocalan her di nava tevgerê de ne û got: "Em azadiya Rêberê xwe dixwazin. Azadiya Rêber Apo azadiya me ye. Divê em hemû bi yek dilî rabin ser piyan û ji bo azadiya Rêberê xwe têbikoşin."
Ayser Xelîl destnîşan kir ku neheqî li Abdullah Ocalan tê kirin û wiha got: "Rêber Apo tecrîda giran heq nake. Lewra wî her dem ji bo aşitî û azadiyê li berxwe da û têkoşîn kir. Ji bo azadiya gelê Kurd divê Rêber Apo serbest bê berdan. Em ê li berxwe bidin heta ku em Rêberê xwe Azad dikin."
Mûna Ehmed jî wiha got: "Em Weke Jinên Kantona Girê Sipî Ereb, Kurd, Ermen em ê di nav çalakiyan de bin heta ku serok azad dibe. Bila her kes bizanibe ku em ê jin Rêber Apo Azad bikin."…*JINNEWS*

## Min Nekujin



**Binevş SARYA**

Min nekujin di nava pêçekê de li ser singa dayîka min. Bihêlin da ez di germa Tebaxê ya weke sêla sincirî de li ber siya singa dayîka xwe bêhneke kûr ji jiyanê bigirim. Bihêlin, bila dayîka min qurtek ava sar vexwe da ji bedena wê şîreke têhnşkandinê xwe berde qirika min û ez jî weke her zarokê li ber singa dayîka xwe ewle û kêfxweş bim.
Bi 10 hezaran zarokên weke min yên cilikreş kuştin û rojên herî germ yên havînê avêtin ber têhna rojê.
Zarokên hê nehatîn dinê ez yek ji wan im û berê dayîka min dan dojehê. Serê sibê hê zû bû. Ji bo silava rojê dayîka min ji xewê şiyar bû û berê xwe dayê. Lê hê silav lê nekirî zebaniyan bi keziyên wê girtin û kêr danîn ser gerdena wê ya mircanî. Min dengê dilê wê baş dibihîst; ne di tirsa mirina xwe de bû, dilê wê ji bo, bav, bira, xwîşk û min lê dida. Ji tirsa, bedena wê dilerizî. Rengê wê çûbû, te digot qey berfa serê sîpanê xelatê ye. Ji bo ku zû nemire carna devê kêrê sist dikirin. Di wê kêliyê de bi awayekî lez bêhna xwe kişand û got keça min, zû bêhnekê bistîne da em nemirin. Tu zanî ku ji te û xwîşk û birayên te gelek hes dikim. Delala min, ha hin bêhn bistîne û ruhê xwe teslîmî zebaniyan neke. Min jî ji dayîka xwe gelek hes dikir û qet nedihişt dilê wê bimîne. Ji ber wê hema çawa dayîka min bêhna xwe dikişand, têra cigerên min nebe jî, ji bo nemirim û dayîka xwe xemgîn nekim min jî bêhneke piçûk digirt. Zebaniyan çavên dayîka min girê dan û bi keziyên wê girtin em di erdê re kişandin. Ji bo ku zikê wê li erdê nekeve, dayîka min li ber xwe dida. Dema li erdê diket bi dengekî nizim ji min re digot delala min, li min bibore ez carna nikarim te biparêzim.
Her çendî min nizaniya ka li derve çi diqewime, lê min zaniya ku rewşek ne asayî heye. Wê kişandin û tevgera qerebalix çend rojan ajot. Piştî demeke dirêj -lê nizanim ka çiqas dem borîbû- carekê min dît ji qirika dayîka min kulmek ava têhnûşîro û bêhna wê ne xweş bi ser min de herikî. Min ji dengê dilê wê zaniya ku avê ne ji bo jiyana xwe vedixwe. Li gorî min ji dilê wê dibihîst em biribûn girtîgeheke binerd û navê wî bajarî Minbic bû. Her roj dayîka min digiriya û bi dilekî xemgîn ji min re digot berxa min, berxa diya xwe, qet neyê dinyayê, ji xwe re di malzarokê de bimîne, ev cîhan ne li gorî te ye. Carna jî derdê xwe bi vê pirsê ji min re digot: Gelo bav, bira û xwîşkên te li kû ne? Min qet nizaniya ka bavê min mirovekî çawa ye. Ka çend xwîşk û birayên min hene, min ew jî nizaniyan û minê qet jî nizanibûya.
Çend roj bi ser re çûn. Nizanim lê dayîka min ji rewşa jinên gel xwe zaniya ku ez bêm dinê wê ew zebanî weke wan jinan dest biavêjin dayîka min jî. Ji ber wê berî bûna min bi 2 rojan dayîka min agir berda bedena xwe. Lê agir vemirandin û birin nexweşxaneya leşkerî ya DAIŞê. Li nexweşxanê ez hatim dinê.
Li girtîgehê jineke bi navê Zehra bi dayîka min re bûye û çeteyan ew jina bêguneh di binê navê namûsê de li garaja bajêr bi keviran kuştine. Roja Zehra tê kuştin ez jî têm dinê. Ji ber wê navê min dikin Zehra.

# Gerîla ji bo Şengalê herdem amade ye

***Fermandarê Biryargeha Navendî ya Parastina Gel Mûrad Karayilan bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Şengalê peyameke nivîskî ji bo Fermandariya Giştî ya YBŞ'ê şand. Karayilan di peyama xwe de got, "Kengî neyar êrîşî gelê me yê Êzîdî bike em ê bibin hêza parastina wan. Gelê me yê Êzîdî divê baş bizanibin ne bi tenê ne."***



Karayilan diyar kir ku divê civaka Êzîdî zanibe ku tevgera Apocî bi emir û fermana Serok Apo her tim li pişt wa ne û got, "Kengî neyar êrîşî gelê me yê Êzîdî bike em ê bibin hêza parastina wan. Gelê me yê Êzîdî divê baş bizanibin ne bi tenê ne."

Fermandarê Biryargeha Navendî ya Parastina Gel Mûrad Karayilan bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Şengalê peyameke nivîskî ji bo Fermandariya Giştî ya YBŞ'ê şand.

Fermandariya Giştî ya YBŞ'ê bi tevlîbûna pêkhateyên Şengalê ve bi armanca 4'emîn salvegera Fermana 73'an merasîmek li dar xist. Di vê merasîmê de peyama Murad Karayilan şandî jî hat xwendin.

Peyama Karayilan wiha ye:

"Destpêkê em fermandariya we û tevahî endamên YBŞ û tevahî gelê me yê Şengalê bi rêzdarî silav dikin û di xebata we de bi dil û can serketinê dixwazin. Di çaremîn salvegera fermana 73'an de em tevahî şehîdên fermanê û şehîdên berxwedana Şengalê bi rêzdarî bi bîr tînin.

Di 3'ê Tebaxê de bi destê DAÎŞ'ê li Şengalê jenosîdek pêk hat. Em ê kêlî bi kêlî hesabê vê komkujiyê bipirsin û ji vir û pê ve ji bo fermanek wisa dubare nebe tedbîrên pêwîst bigrin.

3'ê Tebaxê roja jenosîd û komkujiya gelê me ye. Bi hezaran însanên me bi awayekî hovane hatin qetil kirin û bi hezaran keç û jinên gelê me yê Êzîdî hatin kolekirin. Ji bo me, ji bo gelê me 3'ê Tebaxê rojeke tarî ye. Lê aliyê vê rojê ya duyem jî heye. Di vê rojê de heman demî li hember jenosîdê û tarîtiyê berxwedana pîroz berxwedana Şengalê dest pê kir. Em baş dizanin ku di hundirê vê berxwedana pîroz de hêza we xwe weke YBŞ di nav şer de ava kir. Di bin ronahiya felsefeya Rêber Apo de li hemberî komkujiyê berxwedaneke dîrokî hat kirin.

Bêguman berxwedana li Şengalê bi rê ketî pêşiya komkujiya sedsalê girt. Ger ne ji vê berxwedaniyêbûna guman hebû ku çeteyên DAÎŞ'ê yê faşîst bi deh hezaran, sed hezaran Kurdên Êzîdî li çiyayê Şengalê qetil bikira û jenosîda herî mezin pêk bihata. Berxwedana Şengalê pêşiya vê girt. Dibe îro her kes li xwe mukir nayê, lê heya dîroka 3'ê Tebaxa 2014'an ti hêzên ku li beramberî DAIŞê berxwe bidana û bi ser biketana tunebûn.


Em serbilind in ku îro paytexta DAÎŞ'ê Reqa ji holê hatiye rakirin û li wir zafera şoreşê bi ser ketiye. Em kêyfxweşin ku hêzên Iraqê jî Musil û deverên din ji DAIŞê rizgar kirin û di Iraqê de serweriya DAIŞê nemaye. Lê em baş dizanin ku DAIŞ hîn bi temamî tune nebûye. Projeya wan a dewletê têkçû, lê DAIŞ hîn ji holê ranebûye. DAIŞ bi tena serê xwe êrîşa li dijî Şengalê pêş nexist, li pişt vê êrîşê dewleta Tirk heye.

A niha jî dagirkeriya Tirk bi tifaqa AKP-MHP, Ergenekon û bermahiyên DAIŞê cardin li ser doza gelê Kurd, li ser Başûrê Kurdistan, li ser Iraqê û Şengalê gefan dixwin û tehdîtan dikin. Serokkomarê Tirk Erdogan xwe weke Siltan Abdulhamîd digre dest û dixwaze Iraqê û Sûriyê cardin têxe bin serweriya xwe. Bi vî awayî îro li ser konsepteke nû tevdigerin. Êrîşên wan ên li ser Efrînê bi temamî di vê çarçoveyê de pêşketiye.

### PÊWÎST BE EM DÎSA AMADE NE

Ji ber sedema ku hûn gihiştin asta xwe biparêzin û êdî pêwîstî bi hêzên me nema Tevgera Azadiya Kurdistan paşvekişina hêzên me yê HPG'ê guncav dît. Rast e, em îro ji wir paşve kişiyane, lê em piştrastin ku senger û mewziyên li wir di destê we de ne. Kengî pêwîst bibe em ê cardin li cem we amade bin. Divê hemû gelê me yê Êzîdî bizanibin em weke tevgera Apocî bi emir û fermana Serok Apo her tim li pişt we ne. Kengî neyar êrîşî gelê me yê Êzîdî bike em ê bibin hêza parastina wan. Gelê me yê Êzidî divê baş bizanibin ne bi tenê ne, hêzên xwe yê parastin YBŞ heye. Ger pêwîst bike li pişt wan tevahî tevgera me heye."

## Ferman li kampan hê jî didome



Yek ji berpirsyarên PADÊ yê Silêmaniyê Şêx Cemal Qasim got, "Li kampên koçberên Êzidî yên di bin desthilata PDK'ê de ferman bi şêwazekî nû didome."

Di 3'yê Tebaxa 2014'an çeteyên DAÎŞ'ê li dijî civaka Êzidî qirkirin pêk anî. Bi hezaran Kurdên Êzidî hatin kuştin, zêdeyî 6 hezar jin, keç û zarok ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve hatin revandin û li bazarên Reqa û Mûsilê hatin firotin. Aqûbeta zêdeyî 3 hezar jin, keç û xortên Êzidî yên hatine revandin hê jî nayê zanîn.

Yek ji berpirsyarên Partiya Azadî û Demokrasiyê ya Êzidiyan (PADÊ) yê Silêmanî Şêx Cemal Qasim bi wesîleya salvegera çaremîn a Qirkirina Şengalê axivî û got, "Fermana ku 3'ê Tebaxê rabû ne fermana yekem bû ku li civaka Êzidî hatiye kirin. Em li dîrokê binêrin; ji serdema Osmaniyan heta niha bi dehan ferman li civaka Êzidî rabûn û niha jî li herêma Serhedê, navçeya Wêranşarê yên Bakurê Kurdistanê, dîsa li gelek deveran li dijî Êzidiyan êrîş didomin. Bi qirkirina 3'ê Tebaxa 2014'an re bû fermana 74'an ku li civaka Êzidî rabû."

Şêx Qasim bal kişand ser roja pêkhatina fermanê û got: "Dema ku çeteyên DAÎŞ'ê êrîşî Şengalê kirin, nêzî 20 hezar pêşmergeyên PDK'ê li herêmê bûn. Qaşo wê parastina Şengalê bikira. Mixabin dema çeteyan êrîş kirin, bêyî ku li pişt xwe binêrin û gel biparêzin bi çek reviyan."

Rêveberê PADÊ Şêx Cemal Qasim destnîşan kir ku dibêjin pêşmerge reviyan e, lê ya rast rêveberên pêşmergeyên Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ferman da ku pêşmerge vekişin û gel di nava lepên çeteyên DAIŞ'ê de bimîne.

### FERMAN LI KAMPAN DEWAM DIKE

Şêx Qasim bal kişand ser jiyana welatiyên Êzidî û ev tişt got: "Bi fermanên li civaka Êzidî rabûn re xwestin ku Êzidiyan ji ol, nasname û çanda wan dûr bixînin. Zarokên Êzidî bê xwendin di nava kampan de hatine bicihkirin. Her wiha welatiyên Êzidî li kampên di bin destihilata PDK'ê de nikarin derkevin derveyî kampan û mîna girtiyan e. Dîsa rêyeke tenê heye ku welatî berê xwe bidin cih û warê xwe Şengalê, lê PDK'ê ew rê jî girtiye. Rê nadin ku Êzidî vegerin Şengal û Êzîdxanê. Ev jî bi xwe re şêwazekî nû yê domandina fermanê ye. Ev jî ya ji hemûyan metirsîdartire. Ji ber ku civaka Êzidî ji rastî û çanda wê tê dûrkirin û helandin."…*ANF*

## Yên ku êrîşî Şengal û Efrînê kirin heman kes in

TEV-DEM'ê qirkirina Êzîdiyan a 2014'an ku bi destê DAÎŞ'ê pêk hatî, wekî berdewamiya êrîşên dewleta Tirk nirxand. TEV-DEM'ê bal kişande ser girîngiya xweparastinê û derxistina dewleta Tirk a ji Efrînê.

Desteya Rêveber a Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê têkildarî salvegera 4'emîn a qirkirina Êzidiyan daxuyanî da.

Daxuyaniya Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê wiha ye;

"Qirkirina Şengalê xaleke reş li eniyê mirovahî û tevahî cîhanê ye. Bûyerên ku li Şengalê rû da berdewama xeta dewleta Tirk a li dijî gelê me ye. Kiryarên ku li Efrînê pêk hatin, komkujiyên li Şengal, Til Eran û Til Hasilê, her wiha êrîşên li ser Kobanê berdewama van komkujiyan e.

3`yê Tebaxê salvegera 4'emîn a Qirkirina Êzidiyan e ku çeteyên DAIŞ'ê yên ku desteka xwe ji aliyên navdewletî digirin xwestin bi vê qirkirinê gelê Kurd ê sivîl ê ji baweriya Êzidiyan tune bikin û naxwazin ku hêviyên Kurd bi cih werin.

Di merheleya li pêş de ji me tê xwestin ku em xwe di her aliyan de pêş bixînin û xweparastin û rêbazê xweparastinê li Şengalê xurt bikin. Dijminên me hê jî li rêbazên komkujiyan digerin. Ji lewra pêwîst e ku projeyên pêxistina rêveberiya xweser û xweparastinê pêşkêş bikin. Mafê gelê me yê Êzidî ye ku xwe li gorî van piransîban bi rê ve bibe û erka her kesî ye ku destekê bide. Em weke Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê hemû mirovên ku di Fermana 3'yê Tebaxê li Şengalê şehîd bûne bi bîr tînin û bang li civaka me ya Şengalê dikin ku bi xurtahî xwe bi rêxistin bikin.

Serkeftinên ku QSD'ê li djiî terorê bi dest xistine, serkeftina tevahî gelan e, her wiha serkeftina gelê me yê Êzidî, jin, zarok ên ku hatine revandin e. Derxistina dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê ji Efrînê girîng e. Hebûna Tirkiyê li Efrînê binpêkirinên pîvanên navdewletî ye û pêşxistina projeya terorê li Sûriyê. Yên ku Efrînê dagirkerin heman kesên ku êrîşî Şengalê kirin û komkujî pêk anîn."

## Em ê heta dawiyê gelê xwe biparêzin



Fermandariya YBŞ'ê têkildarî 4'emîn salvegera êrîşên qirkirinê yên li dijî gelê Êzidî daxuyanî da. YBŞ'ê diyar kir ku ji bo Iraqeke federal-demokratîk amadene hemû piştgiriyê bidin.

Fermandariya Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) têkildarî 4'emîn salvegera êrîşên qirkirinê yên çeteyên DAIŞ'ê ya li dijî gelê Êzidî daxuyaniyeke nivîskî weşand. Fermandariya YBŞ'ê ji bo YJŞ û YBŞ'ê ku di dema berxwedana li dijî DAIŞ'ê de avabû wiha got; "Li Iraqê hêzeke ku xeta demokrasiyê esas digre ye."

Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin; "YBŞ û YJŞ hêzeke ku di dema fermanê de hatiye avakirin û ji ber vê sedemê di dîrokê de xwedî ciheke girîng e. YBŞ û YJŞ hem ji bo xweseriya Şengalê û hem jî bingehê azadiya Iraqeke demokratîk li xwe digre û ji bo vê armancê tişta pêwîst çibe wê di demê xwe de bike. Gelê Êzidî êdî xwedî wê îrade û hêzêye ku xwe biparêze. Vî gelî qirkirineke ku ji bo dîroka mirovahiyê şermeke mezine jiya û em weke YBŞ û YJŞ ji bo ku carek din ev qirkirin çênebe di xeta fedayiyê de heta dilopa dawiya xwîna xwe li dijî hemû zihniyeta paşverû şer bikin."

YBŞ'ê bal kişand li ser têkçûna çeteyên DAIŞ'ê ya li Reqa û Mûsilê, li herêmên hatine rizgarkirin hişyarî da ku gefên DAIŞ'ê hê didomin.

Fermandariya YBŞ'ê di dewama daxuyaniyê de wiha got; "Xwepêşandan û serhildanên gel yên li dijî rewşa aborî û nelirêtiyan li Iraqê didomin, di heman demê de gefa DAIŞ'ê ya li herêmê jî didome. Di rewşeke wiha de em amadene heta dawiyê gelê xwe biparêzin. Lı Iraqê tenê rêyek ya rizgariyê heye ew jî xeta demokratîk e. Em weke YBŞ û YJŞ ji bo avakirina Iraqeke federal-demokratîk tişta ji destê me were em ê bikin."



# Çarenûsa 3102 Êzidiyan ne diyar e



***Li gorî daneyên fermî yên Rêveberiya Başûrê Kurdistanê, bi êrîşên qirkirinê yên 3'ê Tebaxa 2014'an ên li Şengalê re tevî kuştina bi hezaran Kurdên Êzidî, 6417 Êzidî ji aliyê çeteyan ve hatin revandin. Ji wan 3315 kes hatin rizgarkirin, aqûbeta 3102 Êzidiyan jî nayê zanîn.***

Li gorî daneyên dawî yên saziya pêwendîdar a Rêveberiya Başûrê Kurdistanê, aqûbeta 48,3 ji sedî ya Êzidiyên di dema Qirkirina Şengalê de ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve hatin revandin hîn nayê zanîn.

Li gorî daneyên fermî yên Rêveberiya Başûrê Kurdistanê, bi êrîşên qirkirinê yên 3'ê Tebaxa 2014'an ên li Şengalê re li gel kuştina bi hezaran Kurdên Êzidî, 6417 Êzidî ji aliyê çeteyan ve hatin revandin.

Endamê Rêveberiya Karûbarên Êzidiyan a Wezareta Ewqaf û Karûbarên Olî ya Başûrê Kurdistanê Xeyrî Bozanî li ser rewşa dawî ya Êzidiyên hatin revandin agahî da.

Bozanî diyar kir ku ji 3'ê Tebaxa 2014'an heta 1'ê Tebaxa 2018'an, ji 6417 Êzidiyên ji aliyê çeteyên DAÎŞ'ê ve hatin revandin, 3315 kes hatine rizgarkirin. Bozanî da xuyakirin ku çarenûsa 3102 kesên hatine revandin, yanî 48,3 ji sedî yên di destê DAÎŞ'ê de ne, nayê zanîn.

Daneyên dawî yên "Rêveberiya Karûbarên Êzidiyan" ku Neteweyên Yekbûyî jî bi fermî ew pejirandiye, wiha ne:

- Hejmara Êzidiyên li Iraq û Herêma Kurdistanê bi texmînî 550 hezar e.
- Hejmara Êzidiyên dema êrîşa DAÎŞ ji 3'yê Tebaxa 2014'an ve de penaber bûne, 360 hezar e.
- Hejmara Êzidiyan li Iraq û Başûrê Kurdistanê koçber bûne 100 hezar e.
- DAÎŞ roja pêşî dema ku êrîş bir ser Şengalê 1293 kesên Êzidî şehîd kirin.
- Heya niha 69 gorên komî li Şengalê hatine dîtin, bi dehan gorên takekesî jî hene.
- Gava DAÎŞ êrişî Şengalê kir 68 perestgeh û mezel û cihên olî yên Êzidiyan hatine teqandin û xera kirin.

### ZAROKÊN BÊ DÊ Û BAV MAN

Bi giştî 2745 zarokên Êzidî bê dê û bav bûne.

- Zarokên bê bav mane: 1759
- Zarokên bê dayik mane: 407
- Zarokên bê bav û dayik bûne: 389
- Zarokên hê jî bav û diya wan di destê DAÎŞ'ê de ne, yan jî nehatine azadkirin: 220

### HEJMARA ÊZIDIYÊN JI ALIYÊ ÇETEYÊN DAÎŞ'Ê VE HATINE REVANDIN

Bi giştî 6417 kes hatine revandin.

- Zilam : 3548
- Jin: 2869

### HEJMARA ÊZIDIYÊN JI DAÎŞ'Ê HATINE RIZGARKIRIN

Bi giştî 3315 kes ji destê DAÎŞ'ê rizgar bûne.

- Ji jinan 1155 kes rizgar bûne.
- Ji mêran 337 kes rizgar bûne.
- Ji zarokên keç 953 kes rizgar bûne.
- Ji zarokên xort 870 kes rizgar bûne.

### DÎLGIRTIYÊN AQÛBETA WAN NAYÊ ZANÎN

Bi giştî 3102 Êzîdî nehatine rizgar kirin.

## Li dora YBŞ'ê bibin yek



MLKP/Rojava diyar kir, li Şengalê li dijî DAÎŞ'ê, Erdogan û PDK'ê berxwedan hatiye kirin, şehîd bibîr anîn û bang li civaka Êzîdî kir ku hêzên xweparastinê biparêzin.

Rêxistina MLKP/Rojava têkildarî salvegera qirkirina Şengalê daxuyaniyeke nivîskî da. Di daxuyaniyê de şehîd hatin bibîranîn û hate gotin, ''Em bang li civaka xwe ya Êzîdî dikin ku rêxistiniya xwe ya xwerêveberiyê bikin, li dora YBŞ'ê bibin yek, li djî komkujî û îxanetê berxwedanê geş bikin.''

MLKP/Rojava got çeteyên DAÎŞ'ê yên bi paşmêriya AKP'ê bi sedan Êzîdî kuştin, bi hezaran êsîr kirin û PDK jî tenê bûye temaşevan.

Di daxuyaniyê de hate gotin AKP'ê û hêzên paşverû yên herêmê bi çeteyên DAÎŞ'ê xwestine ku civaka Êzîdî bi temamî ji holê rakin, qira Êzîdiyan bînin, ku ne ji gerîlayên HPG'ê bûne, ku koridor li Rojava vekirin û gel gihandin qadên ewle û ne ji hêzên YPG-YPJ û MLKP'ê bûne wê ev armanca xwe pêk bianîna.

Di daxuyaniyê de hate gotin Erdogan ê dîktator piştî şikestina çeteyan ev pê nexweş hatiye, bi balafiran Şengal bombe kiriye û got, ''Piştî dagirkirinê civaka me ya Êzîdî ku yekîneyên berxwedanê ava kirin tenê li dijî çeteyên DAÎŞ'ê tênekoşîn. Ev têkoşîn her wiha li dijî xeta PDK'ê ya îxanet û hevkariyê jî bûye.''

MLKP/Rojava herî dawî got civaka Êzîdî ku hêzên xweparastinê biparêze dikare pêşî li komkujiyên nû bigire û bi avakirina xwerêveberiyê dikare derxîne holê ku ev qas êş ne beleheq hatine jiyîn.

## HSM'ê li Qamişlo buroya xwe vekir




Partiya Sûriya Pêşerojê buroya xwe li taxa Miwezefîn a bajarê Qamişlo vekir. Bi dehan şênî, nûnerên partiyan û şandeyek partiyên ji bajarê Suweydayê beşdarî merasîma vekirina buroyê bûn.

Mersîma vekirinê bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir. Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê Îbrahîm Qeftan bi xêrhatina beşdaran kir û kêfxweşiya xwe bi vekirina buroyê anî ziman.

Qeftan di axaftina xwe de wiha got: "Ez bi vekirina buroyê re kêfxweş im, lê xweşiya min temam nabe beriya ku buro dest bi kar bike. Avahî kevir e lê bêyî mirovahî xweş nabe. Partiya Sûriya Pêşerojê erka lihevkomkirina civakê girtiye ser xwe. Li ser vê yekê ez vekirina buroyê li gelê Qamişlo pîroz dikim."

Qeftan di berdewama axaftina we de, spasiya şandeya ji bajarê Suweydayê hatî kir û ji ber komkujiya ku pêk hat ji Suweydayê re sersaxî xwest.

Bi navê şandeya Partiya Sûriya Pêşerojê ya ji Suwedayê Semîr Ezam axivî, vekirina buroyê li bajarê Qamişlo pîroz kir û hêviya serkeftinê xwest û wiha got: " Bawerî ji xwedê re ye û welat ji her kesî re ye. Em Sûriyeke nû dixwazin. Partiya Sûriya Pêşerojê partiya Sûriyê ye."

Piştî axaftinan, peyamên pîrozbahiyê hatin xwendin.

Buro ji aliyê dayika şehîd Sariya Feyrûz Yûsif, dayika şehîd Şervan Emûşa Deham û dayika şehîd Orhan Zeyneb Yehya ve hate vekirin…*ANHA*

**Fener**



## Tirkiye nefesa dawî li Îdlibê dikişîne

Idrîs HENAN

Piştî hevdîtina Trump- Pûtîn li paytexta Fîlande Hilsinkiyê, saheya Sûriyê rastî pêşketinên bi lez û girîng hat. Nakokiyên çeteyên ku Tirkiyê piştgiriya wan dike, taybet piştî gefên serokê rejîma Sûriyê li ser Idlibê, zêde bûn. Komên çete demildest nav û çermên xwe guhartin. Bi taybet koma bi navê Heyet Tehrîr Elşam amûrê sereke ya dewleta Tirk li bakurê Sûriyê ku Tirkiyê bi riya wê koma navê xwe li ser lîsteya terora cîhanî heye, hebûna xwe li herêmê misoger dike. Piştî civîna Sûtşî jî, bi lez istixbaratên Tirk ketin tevgerê û hemû komên çete li Idlibê di bin navê Eniya Neteweyî ya Rizgariyê de komî ser hev kir. Tirkiyê dixwaze bi vê yekê him dagirkeriya xwe ji axa Sûriyê re dewam bike û him jî rewatiyekê bide çeteyan. Lê li gorî pêşketinên pêvajoya aloziya Sûriyê û qonaxên lidarxistina civînên Astana û Sûtşiyê, tê fêmkirin ku dewleta Tirk piştî her civîneke beşek ji axa Sûriyê dike qurbanê berjewendiyên xwe û difiroşe Rûsyayê. Li gorî agahî û nûçeyên derdikevin, xuyaye piştî radestkirina herêmên başûrê Sûriyê, wê pîtoleya siyasî, leşkerî û gengeşeya dîplomasî ya bazara navneteweyî ber bi herêmên bakur, bakur-rojavayê Sûriyê ve bizivire. Ango Idlib wê bibe sernavê merheleya nû ya aloziya Sûriyê. Ji bo ku Tirkiyê riya êrişike muhtemel a bi ser Idlibê ve bigire, ev kom anîn cem hev û rihên wan teraş kir. ji bona vê yekê jî wê Tirkiyê bi lidarxistina kongreyekî giştî ji bakurê Sûriyê re, hewl bide biçimekî sivîl bide van çeteyan. Wê hewl bide ji Idlibê re rêveberiyek sivîl ava bike. Wê çeteyên ji tevahî Sûriyê kom kiriye ji bo berjewendiyên dagirkeriya xwe ji axa Sûriyê re bike polîsên bê pere.

Li gorî pêşketinên bi lez, aliyê siyasî de jî diyar dibe ku herêm ber bi terazûyekî nû ya blokbûnê ve diçe. Taybet piştî dagirkirina Efrînê û radestkirina herêmên li Şam û başûrê Sûriyê. Di aliyê hundirîn de hevdîtina MSD û rejîma Sûriyê hebû. Diyare ew jî di encama hevdîtina Hilsinkî de bû. Hevdîtin di asta têkoşîna hundirîn a gelên Sûriyê de gavek baş û girîng e. Her wiha carek din isbat dibe ku tenê hêza xwedî proje dikare li Sûriyê bibe xwediyê dengê bilind. Çiqas bê paşguhkirin, lê dawiyê de wê ev hêz bi projeya xwe ya çareseriyê re bibe nûnerê rastiya nirxên vê civakê. Ji ber ku dîroka Rojhilata Navîn dibêje; çi proje, sîstem û çareseriyên bi heqîqeta gelên vê herêmê re ters bin, wê muheqeq mehkûmê tunebûn û şer bin. Niha jî tişta me li jor gotiye rastiya vê herêmê tekez dike. Ango Tirkiyê çiqas van koman cîlaw bike û di bin sernavên biriqî de bîne gel hev, ji ber ku ne xwedî projeyekî neteweyî ku azadiya gelên li Sûriyeyê temsîl dike ne, wê nola hemû deverên din ên Sûriyeyê dehfî tunebûn û şeran bin. Di encamê de wê bi bin kevin. Tenê projeya gelên Sûriyê wê bi ser keve. Ti aliyek bi nirxên ji derve ve nikare vî welatî bi rê ve bibe, ne jî bi hişmendiya berê a netew dewlet ev welat tê birêvebirin. Ancax kesên ayîdê vê herêmê bi xwe karibin guherîn û veguherînê çêbikin. Ji ber van rastiyan xuyaye wê dewleta Tirk Idlibê jî di oxira berjewendiyên xwe yên hundirîn û derve de parçe parçe radest bike. kirîza lîreya Tirk a di encama dîktatoriya çors de rûdaye, nîşaneyeke ber bi çav e.